
du neqra mosela
halet dirêjkir ,û halet hinekî zaqif kir da ku gîsin
di nava zemînêde pirtir here xwarê û bi kêf û cewşen
karê xwe kir û qîr kir strana xwe û got:
hey coto coto coto ,
vê berbangê çi sare

hey coto coto coto
Hêstira min xumare
Hey coto coto coto
Xwelîl kesên xeware
Hey coto coto coto
Hemo mêrkî dijware
Hey coto coto coto
Himber neyara are
û hey destê xwe li ser şûrik girantir kir da ku gîsin pir
tir here xwarê tûm,
Qurmik û rehên garûşê carna li gîsin dîgerin lê Hemo
zû bi labûtê paqij
Dike û hey hore- hora wîye.
Bi vî awayî Hemo pêjna dengê Ji dûrve kir, li dora
direve û zilamek şivek di destan xwe zîvirî dit ku jinek
deye ew jî li pê baz dide, û jêre bi hêrs dibêje: ma tê bi
ku de here jinê- ezê îro te têr lêdan bikim jinik ji hey
gazî dike haho hewarê ez dixîlê mêrê çême, ev zînatkar
ku bigihê min wê min bikuje û bi vî awayî xwe gihande
nêzîkî Hemo û gazî kirê cotkaro ez dibextê te û xwedê
deme , di bextê mêrê çê de me, belkî tu min ji vî zalimî
bi parêze , û pêre xwe avêt pişt Hemo.
Hemo Nemerdî nekir û bankire dewarê xwe Hoş hoş.
, rawestîyan Hemo bi ser mêrik de zîvirî û Herdû hêstir

got kuro lêdana jina şerme pîrek darê şikestî ne vê
berbangê tu ci ji vê belengazê dixwaze Ev xwegirtîya,
xwe avêtîye tor û bextê min dinav hoz û élan de şerme
ku ez bihêlim tu lêbide

mêrik lêvegerand û got..kuro cotkaro, ev jina mine,
Xatêye, îro gunehêkî mezin kirîye, devê mexmera şîr
vekirî hiştibû û kûçik hatibû ew çelpandibû û jê
vexwaribû melayê gund jî ji min re got şîr birijînin ,û
mexmer jî me heft caran bi avê û axa sor şuşt heyanî
me pakîz kir û êrîşî Xatê kir û

şiveke dijwar lêxist ax malxirabo te ez kuştim Xatê
wisa got lê hemo wek mere mêrxas herdû destên wî
divê ez te danîne ser hev: xuyaye tu şerm û fihêt nake
îro teres bikim û ew avête xwarê û kete ser zikê wî bi
kurm û pihîna mêrik Ban kir jinaxwe. ,keçê ma tu
nabîne, xatê, ku ev cotkarîyê xerib li min dide, qey tu
bênamûsî? Xatê wê çaxê bankir wa weylê li min
çawa tu li delalê dilê min dide û bi kêstek û, nihit û
cotkaro, çepeloşilîna,:

jiçar hawir de li hemo da Hemo rabû ser xwe û got li u
, çawa min ev şîreta bav û bapîra ji min bê hiş û nezani
bîr kirîye çaxê digotin

orta mêr û Jin
deryake mezin
yê ku tê kevê
wê here Ji bin

D,rokek Dankut.

Berevkir : SALIH> HEYDO

Xwendevan. n h. ja / delal em
dixwazin di v. hejmar. de ji kovara
we (*GULSTAN*) ji were d,rokeke
dankut. / away. kar. w. \irove
bikin]



\awa t. zan,n. pi\t, gund, dan/k.
xwe di kel,nin / li ser baniyan
radixin ku hi\k bibe d,sa av. hinek,
l. dikin [mer\ [xal, `e [mehf/r / zilhokan li ser qad.
radixin bi awayek, `argo\`e / w, dan, berebere li ser
vala dikin [`ar zilam li dor. radiwestin / m,kwit.
wan li ser p,y. n wan [dest / zend. wan ramalay,ne
[her nav bera xortek, ji wan ke`ek didin ber [tev li
koma lib. n kutay, dikin ji wan ke`an re t, gotin
danber / p. re d,rok. n xwe\ di b. jin / yariy. n wan
dibe di w. hing. de keval / kil,\ek, pir xwe\ di gel
deng. m,kut / awaz / r,tma m,kut `av / guh.
mirov t. r / tije dike ev d,roka min li j. r niv,sandiye
[xortek di b. je li d/hev heyvan, ku firdika xwe bi
daw, t,ne pa\ . radest, heval. xwe y. d,tir dike /
j. re di b. je hevalo dora te ye [her wiha y. n d,tir j,
firdika xwe bi daw, t,ne / her wiha radest, heval.
xwe dike / wisa li hev digerin / ke`ik j, li wan
vediger,nin [d,rok bi ritma giran, li gor lebata

m,kut / hilatin / dahat,na w, t. gotin / awaz kirin.
[h.jay, gotin. ye ku ev kar / bar. dan kut. hem, di
demsala pay,z. de dib/ / ev d,rok hem, dihatin
gotin ji bo westandina xwe ji b,r bikin [d,rok eve :

HER WAB<

Her wab, wab, wab,
Dankut li mala web,
Danber ji mala meb,
Desmala `argo`eb,
Go`e ji go`e z. deb,
Go`ek li ser mil. te b,
Go`ek li ser mil. min b,
Her go`ek t. lek l. b,
Her t. lek k. lek l. b,
Her k. lek z. rek l. b,
Her z. rek muhrek l. b,
Her muhrek neq`ek l. b,
Her neq`ek navek l. b,
Ew nav nav. xwed. b,
Nav. din . yar. b,
Hevalo deng. m nay.
Hevalo dora te ye
v. ga pi`t, v. firdik. xort. d,tir d,rok. ji dev. w,
digire / firdika xwe di b. je :
Hers. mal. newel.
Malek j. mala xal.
Taj, berda xezal.
Tu bine 'l keys / fesal.

Hilandim bejn / bal.
 Newq p. `ay, b'desmal.
 Te rind. sivka mal.
 Dan dagirt, b'p. \mal.
 Xwed. hevza me bik.
 J'tomet. v. jinx al.
 Hevalo deng. m nay.
 Hevalo dora te y.
 her wiha xort. n d,tir j, firdika xwe ji dev hev
 digrin / dib. jin :
 Hers. mal. li ko\k.
 Taj, berda kero\k.
 Malek j. mala xw,\k.
 Esmer. por kur,\k.
 Xwe daye ser an,\k.
 Xwed. hevza me bik.
 J'tomet. mala xw,\k.
 Hevalo deng. m nay.
 Hevalo dora te ye]



QEWLÊN ÊZDIYAN

Eskerê BOYÛK

- 1 -

1. *Qewl û folklor (zargotina gelêrî)*

Qewlên Êzdiyan kevnin. Ji kûraya dewrana tîn. Çiqas ji min va eyane, tu bingehê wan a nivîskî nehatye, negihîştî me. Ew bi zarkî ji nivîşkê derbazî nivîşên pey xwe bûne. Ji sedî nod bi zaravê kurancî ne. Heta roja îroyîn jî gelek ji wan rind hatine parastin. Eger bi zarkî hatine xweyîkirin usan e wan jî curek ji nimûnê zargotina (folkilora) kurdî karin navkin.

Çawa eyane nimûnên edeba her gelekî cihanê usan jî ya Kurda bi du rîya hatine gihîştî rojên me:

-Edeba nivîskî, bi nîşanên nivîsandina cûrbicûr li ser kevîran, ser çermên heywanan, ser mêtalan, kaxazan û tiştên din gihîştî me.

-Edeba devkî, yanê zargotin.

Zargotina kurda, ya gelêrî pir dewlemend, pircûre û pir sercem e: çîrokin, destanin, beytin, bîranînin, kilamin, mesele, metelok, têderxistinok, laqirdî, pêkenok, nimûnên dînî ne, nîfir, çêr û gelek-gelek tiştên dinin. Ev navên, ku me dan jî ji sirya xwe da beşên wan yên cuda hene. Mesele kilam (sitiran) li ser gelek beşan tîn parevekirin: kilamên dîrokî, yên mêranyê, şerra, yên dila, govendê, xerîbyê, şinê, yên dema xebatê tîn gotin, yên dema bûkê sîyar dikin, yên dayîk li ber lûrka zaroka xwe dibêjin û hivd.

Beşek ji zargotina Kurdî nimûnên (têkstên) dînî ne. Di nav wan da jî nimûnên dînê Ezdiyan: qewl, beyt, due'a-dirozge, xizemok, lavêjok, fayîzok, çivanok û tiştên din cîyê

xwe yê layîq digrin. Dîne Êzdiya bawarîke kurdewarî, ya kevnar e, bi dewrana, çawa me berê jî got, u'lmê vî dînî bi zarkî (kurmancî) hatye xweyîkirin. Civaka Êzdiyan jî bi wî ulmî rêva çûye.

Eyane ku Êzdî rêke dîrokî, ya pir dijwer ra derbaz bûne. Di halên tunekirin û zordarya dewrana da, dema gelek civak, millet, dewlet, bawaryên ji Êzdiyan mezintir û bi bandortir li ber tofana bawaryên nû teyax nekirin, ser û binî hev bûn, helyan, bûne bîranîn, di bin kelefê xwe da man, êzditî ma, unda nebû, nehelya... Di vî werî da rola ulmê vî bawaryê pir mezin e. Usane wî ulmî bersîva guhestinên dewranê, bersîva xwesteka bawarmendên xwe, di qewlên jîyana nû dida, bi felsefe û kûraya fikirî ji bawaryên nû danedixist... Çiqas jî zulm û zor, qir û bir, neheqî, fermanên tunekirne yê xezev anîne serê vî civakê, rêya rev û malwêranyê dan ber wê, nikaribûn ulmê bawarya êzdityê ji serê Êzdiyan derxin. Êzdiyan ulmê dîne xwe xweyî kirin. Ulmê dîn jî ew xweyî kirin, ziman, xeyset, ruh û kurdeyatya wan xweyî kir, anîn gîhandin roja îroyîn.

Di nav folkilora Kurdaye gelêrî da, ulmê dîne Êzdiyan ça cûrekî zargotinê, bi xisûsî û tebyetmendyan e. Xasma di werê Qewla da...

Dema lêkolînavan çend varyantên cuda-cuda, yê nimûneke zargotinê (ji heremên Kurdisranê yê başqe-başqe, ji zarên zarbêjên cuda hatine nivîsar û hvd) didine ber hev dibînin, ku di nav varyantada cudatyê pir mezin hene. Carna tek naverok hatye xweyîkirin, heta gelek nav û bûyar, cûre û pirsgirêk jî hatine guhestin, hinek tişt hatine bîrkin, hinek zêde bûnê, tiştên ne cî da hatine ketinê, bûyar û nimûnên cuda tevlihev bûne û hvd... Cîkî bi sitiran tê gotin, cîyê din tê şirokirin.

Zarbêj jî di warê zanîna ziman, şureta şirokirne, ji hev hildanê, ji hev fêrbûnê da weke hev nînin. Eger nimûna

zargotinê ji zarê zarbêjekî zaneyî bi şuret tê nivîsar, ewî jî ji zarbêjekî zane ew nimûne hildaye, qîmetê wê varyantê jî pire... Payê zarbêjayî pirê gelekî bêxem nêzîkî nimûnan dibin... Çîrokbêjî- zarbêjî wek dengbêjyê di nav gelda tucar nebûye pêşe, mijûlbûna, Ji bo bingeha nivîsar ya nimûnan tune pir cara bi gorî xwe, bi zaravê xwe zarbêj wan şiro dikin, çap, rîtm û mûzîka wan xweyî nakin, yekîtyê diteribînin, qewimandina li nav hev dixin, gorî xwe tişt zêde yan kêr dikin. Carna fikir û ramanê xwe jî dikine nav wan. Heta roja îroyîn jî hinek dengbêj miqamê kilamên kevn hildidin û li bejna kilamên xwe yên nû dikin û bêy fedîkirin dibêjin: „Peyv û mûzîk ya mine...”

Çi me derheqa zargotinê da tomerî got, di warê ulmê ayîna dînê Êzdiya da, îlahî derheqa Qewla da mirov nikare usan bêje.

Di nav ulmê dînê Êzdiyan da, yên here pîroz Qewlin. Ezdî bi hurmeteke pir mezin û fesal nêzîkî qewlan dibin, guhdarya mezin datînin li ser xweyîkirina wan, dibêjin: *Me îman ji Qewlê ye.*

Dîndarên ku ulmê dîn rind zanin li nava civakê da pir bi qedir û qîmetin. Zû têne naskirin, civak pey wan diçe, teva zefir wan teglîfî şîn û mesrefa dikin, fikira wan ra hesav rûdinên, para wan jî di xêra da mezine. Ji bo wê jî her dîndarek dîcedîne zanebûnê xwe yên oldarî û civakî dewlemendke û ji dewsa xwe (şûna xwe) ewledên xwe hazirke, ku wê pêşîkêşyê û kanya aboryê ji destê ocax û malbeta xwe bernede.

Civaka Êzdiyan di dîroka xwe ya dûr û dirêj da mîna adê ji hev qetyayî, li nav derya xezev da jiyane (li Rûsyayê, Kurdistanên Bakûr, Başûrê Rojava, Başûr û gelek heremên din). Der-dora tim bi çevê neyartyê, neqencyê û tunekirinê dîn û bawarya wan nihêrîne Di navbera wan heremên Êzdiyan da pêwendî, hatin-çûyîn pir kêr bûne, lê dema

sebeqên qewlên di nav wan da hatine parastin didine li rex hev dibînin ku pir tişt rind hatine xweyîkirin.

Em du sebeqa (malik) ji destpêka qewla ŞÊX Û AQÛB ji du çevkanyên ji hev dûr bînin û himberî hev bikin:

**1.Şêx go: „Aqûbê mino, çendî roje, çendî şeve,
Min e'cêvek dîtîye ewe,
Mesîkî be'rêdaye durreke deve,
Ewî me'sî, ew dur, ew be'r, dikşand xweve.
Aqûb go: “ Seydayê mino, tu xudanê surre,
Qe ne ji wî me'syê, ne ji wê berê, ne jî wê durrê,
Kesî ne dîtîye kişmîş ser berê.**

Ev Qewla sala 1973 a li gundê Quruerz, nehya Hoktêmbêryanê, li Ermenistanê ji zarê Ahmedê Şêx Osê hatye nivîsar. (Ordîxan û Ceflê Celîl, Zargotina Kurda, Moskva 1978.)

**2.Çendî roje û çendî şeve
Ez fikrîme ber xova
Min masîyak li behrê dît dûrektli deve
Ew behre ewî masî u ewê durê di kêste cem xove
Aqûb dibijît: Hey şêxê mino sîrrê
Heke ji ber behrê nebe masî û ji ber durrê
Dê çawa min û te mewîj dibane li ser wê berrê
(Xidir Pîr Silêman, EZIDYATÎ, Dihok 1996.)**

Em nimûnekê ji du nivîsarên Qewla SEREMERGÊ bînin. Yek me hildaye ji Kovara LALIŞ hejmara 7 a (Dihok-adar-1997), ku ji alyê Bedel Feqîr Hacî da 4. 7. 1974. ji zarê bavê xwe, alimekî dînê êzdiyatî ye dema me Feqîr Hecî kurê Feqîr Şemo nivîsye. Ya din ji pirtûka ÊZDANAME 1 (Weşanên Laliş, rû.119).Nehatye kifşê gelo kê ji zarê kê nivîsye. Lê bi texmîna me ji zarê Qewlbêjê Kurdistanê Tirkîyê hatye nivîsar.. (*dûmahî heye*).

DERWÊŞÊ EVDÎ

Gulistan

*Hatiye guhestin ji devê dengbêj Ehmed Zeynal li
Kurdistana bakûr bajarê Wanê navça Çaldêranê
(çardêranê) qeza Mûradîyê xelkê gundê Girmora,
rûniştîyê gundê Sawoxsûyê , emê di vê jimara gulistan
de xelesa yekê bi weşînin , hêvîdarin demek xweş bi
vê mijarê re derbas bikin ..*

-1-

Ay lê yardê... Wey... lê yardê...
Dilê mi li yane, lolo dilê mi li yane.
Sed car dilê mi lîayane.
Serê dilê mi bi kul û derd û bi kovane.
Gidî binê dilê mi bi dûmane.
Bi salxê salixdaran dibên Seîd û Telhan du birane.
Seîd birê mezin e, birê biçûk jî Telhane.
Birano du fîdanin, rebê mutealîyê bixu dizane.
Zeman zemanê bê bavane.
Heyam heyamê bed`eslane.
Dibên gelesa pîlanê indakirina herdû zilama ji xwe ra qirar
dane.
Seîd digo: "Telhan bira welatê hanê welatê nanerzane.
Rabe emê bikin tedarekê kariwane.
Emê berê xwe bidin hîmê binê berîyê çend salan herine
kariwane.
Xudê heyanî belayetê rêç dike ji devê musulmana, yaxa me
xelas dibe ji pîsane. Dayê...hay...
Hey yar dê dilê mi li yane.

Sed car dilê mi li yane.
 Serê dilê mi kule, binê dilê mi bi dûmane.
 Seîd û Telhan her dûya ji hev ra qîrar dane.
 Her dû bira berê xwe dane hîmê binê berîyê xura çûne bi
 kariwane.
 Heft roja hajotin bi rê dane.
 Lawo rêka dûr û derêje, ne bi gotin û xeberdanê cemaeta di
 girane.
 Roj kete roja di hestane.
 Dîna xwe didanê rastekî rast usane.
 Yeqîn dikim xîz li çokê hespane.
 Jê ra dibên hîmê binê berîyê, cîyê hût û lehengane.
 Mêrkê camêr nebîne derdê bêdermane.
 Li hîmê binê berîyê her kesek nasekine li ber alvê mêrane.
 Her tim û cara li wê muhîtê ret nabin dengê rimane.
 Her kesek îro nahejîne qedrê rimane.
 Her dû bira ketine (serê) rê û dirbane.
 Dîna xu didanê êlekê giran dnîye li serê rast û di bestane.
 Xeyo....
 Hey lê yardê... wey lo...lo... wa...dilê mi li yane sed car dilê
 min li yane.
 Serê dilê mi bi kule, binê dilê mi bi dûmane.
 Ew her dû zilam meşiyane nava êla di girane.
 Dîna xu didanê kunekê li ser bîst û çar istûnane.
 Heft perde li kon da girêdane.
 Kula xudê bi kul be bikeve mala bavê xûyê konê di girane.
 Ez (ji) we ra yeko yeko bidim salixê perdê di konane:
 Birano! Perda yekê cîhê rûniştina mêran û hût û lehengane.
 Perda dûyê cîhê rûniştina xanima û canikane.
 Perda sêyê cîhê kebanî û serkarê di malane.
 Perda çarê cîhê kalê li ber sêlane.
 Perda pêncê cîhê tewinkeran, belê dikin neqş û nemûsane.
 Perda sesê dibêjim hoza mîyane.

Perda heftê koza berxane, li pişt perdê da cîhê tewla
meyinegîyane.
Dîna xwe didinê qîz û bûkê(n) Kîkan û Mila rûniştine li bin
perê konane.
Zendê bi helî morî hildane.
Gidî çawa dûdinên, du kevirê loqloq û antîqe pêda bi dar
dane.
Ne hacetê elektirîk û şemdan û çirane.
Qîz û bûkê(n) Mila tim û tim û caran li ber dikin şeir û
nemûsane.
Bidim salixê konê di girane... Wêl wêl wêl ..
Ay lê yardê dilê mi lîyne.
Xeyo serê dilê mi bi kule, binê dilê mi bi dûmane.
Wa(n) bilama dîna xwe didane rûniştina cemaeta di mêrane.
Dîna xu didane darcixarê destê wan sê bihost û sê tiliyane.
Wa(n) zilama îro cixare avîtine ser kokê qelûnane.
Dû ji devê hevdu direvînin mala we şewitîyo notila borîyê
di sobane.
Dîna xu didanê gulikê ser wan sê bihost û sê hoqane.
Pêçê serê wan hemû rîsiyê şeirê Dîyarbekir jorda ber enîya
da berdane.
Li milê wan dinêrin, ebayê hezoyî sê bihost û sê ritmane.
Li nigê wan dinêrin reşikin, mala we şewitîyo tamam
rûniştine bi hev ra ketine disimîsê di girane.
Kulika xu dane orta îmanê birû û bijangane.
Seîd digo Telhano bira! Eva heşt roje em retine serê rê û di
dirbane.
Me kirîye bîra xamê di mangane.
Hey mala te şewitîyo birçîna qudûmê me çûye herê tacete
me nemane.
Lingê me nagire rikêbê zengîyane.
Destê me nagire desgirîyê (dizgînê) meinegîyane.
Malşewitîyo em birçîna mane serê rê û di dirbane.

Bajo derê konê hane.
Em bixwin qote(k) nane.
Li memleketê me bûye axirdewrane.
Yeçîn dikim niha çor û çoçixê me birçîna xwe dane ber
dîwarane. Wêl wêl...
Ay lê yardê ...
Xeyo dilê mi li yane, sed car dilê mi li yane.
Serê dilê mi kule, binê dilê mi bi dûmane.
Her du hajotin derê konê di girane.
Dîna xu didanê kişiyaye pêşiya wan sêsed mêrê xûyê kulik
û ebane.
Vana qilçikê erebî li ser enîşka da vedane.
Jor da meşiyane li ser sinîyane.
Dixwin birincê Qereçamê dûvê helikane.
Milê wan zilama heta enîşkê di don û rûn da mane.
Qet kesekî negot ew her dû zilamê hanê ser pişta hespa
mane.
Lawo derbas bin ji boy Xudê bixwin qetek nane.
Seîd çav kire Telhane.
Go eva kona konê nemerdane.
Bajo em derbas serê konane.
Lawo nadine me qotek nane.
Ew zilamê hanê xweyê kulik û şeir û ebane.
Me ji xwe ra nagirin seyîsê hespa natele ji êlê ra golikvane.
Lawo bajo em herin serê konane.
Em xerîbin nadine me qotek nane.
Wêl wêl wêl... Ay lê yardê ...
Lololo ... dilê mi li yane.
Sed car dilê mi li yane.
Gidî binê dilê mi bi mij û bi dûmane.
Gava ku van zilama hev ra xeberdane.
Vergerandin serê hespan û medenê meinegîyane.
Derbas bûn serê di konane.

Menzilekî hajotin menzilekî di girane.
Dîna xwe didanê îro konekî tek vegirtîye dûrî konane.
Konê vî zilamî li ser heft istûnane.
Belê perdê kon rîşiyêd hevirmûşin peng bi peng bi hev dane.
Kalekî nûranî rûyê wî sipîye li ser çokane.
Diran di dêv da nemane.
Hey lawo îro şaşikekê li sêriye, tizbîyekî sed û yek lib di dêst dane.
Li ser postekî nimêjê rûniştîye ji xwe ra dikişîne selewat û werdane.
Seîd digot Telhano bira bajo derê konê hane.
Ew konê hanê yeqîn dikim tertîla wî misulmane.
Wa hard û zilama ho kirin deve û mîratê qantirane.
Hajotin derê konê di girane.
Ew kalê nûranî ji ber wan rabûye ser pîyane.
Gidî girtîye serê hespane.
Çav kire navmalê û qaweçiyane.
Go lawo bigre bi serê hespane.
Cil û ciholê serpiştê heywana jê bikin bavêne perê konane.
Hevsarê serê heywana bişiqitînin bavêjin hêsîyê konane.
Wa heywana berdin serê rast û bestane.
Hema zivirî li nava kon da belê doşikeke qûstûkî avête erdê, beilgîyê bi sê legan li ber pişta wane.
Ew kalê nûranî sekinîye li pêşbera kon li pêşîya zilama dike hurmeta girane.
Seîd bang kirê go apo rûyê te sipîye li ser çokane.
Yasê te derbas bûye, tu li ser pîya sekinîyî dikî xizmeta girane.
Erê dibê ji mi ra nebase, ne şerefa mêrane.
Lawo îşê we tune bi xeberê hane.
Hûn xerîbin ne ji van derane.
Hurmeta mêvan tim û tim û caran ji bona xudane.

Ay lê yardê... Wêl wêl wêl...
Lololo...dilê mi li yane.
Serê dilê mi kule, binê dilê mi bi dûmane.
Seîd pirsî go apo êlekê danîye li serê rast û bestane.
Konekî giran li sertacê konane.
Heyanî pênc hezar mal(î) di bin konan dane.
Rêşîyê konan peng bi peng bi hev dane.
Gelo ew kona konê kêye, êla çi kesane.
Go lawo ew êla tu dibêjî êla axayê mîrê Milane.
Go apo êla wî da qerebalixek hebû ew çi qerebalixeke di girane.
Go lawo ma tu nizanî ew kona konê mîrê Milane.
Sêsed mêr tê da rûniştine li hundurê konane.
Her yekê reîsê êlekê, li kon da rûniştine ji hev ra bi xeberdane.
Belê go lawo ji mîrê Mila ra hatîye kaxeza gawirê Çîlosmane.
Go apo sebebê wê çîye û çimane?
Go tê da nivîsîye bide min hozê mîya kozê berxane.
Yê bide min barê zêra qenterê devane.
Yê bide min xerac xemil û rewsa konê erebî, ceinîya miîna Leylane.
Yan jî yê sorgulîyê Edûla qîza xwe ra bigire ji mi ra têxe kebanîya mala girane.
Yan jî bila tedarukê xwe bike, şerê mi pê ra heye, şer û cenga girane.
Ê, go apo sebebê wê çîye û çimane?
Go lawo gawire jê ra dike xeberdanê di girane.
Ê, go apo lê tu kiyî, navê te çîye, û te çima ha tek danîye û tu naçî nava wane.
Ay bê yardê... Wêl wêl wêl...
Lololo...dilê mi li yane.
Serê dilê mi kule, binê dilê mi bi dûmane.

Lawo emrê min derbas bûye, hatîye nod û negane.
Tu bala xwe bidê diran di devê mi da nemane.
Rûyê mi sipîye li ser çokane.
Lawo çokê mi ne yê doşekane.
Tilî pêçkê min ne yê birincê Qereçamê dûvê Helikane.
Lêvê mi ne lêvê qehwane.
Navê mi Şêx Evdîye ez bavê Derwêşim belê emrê mi derbas
bûye ji nod û negane.
Seîd jê pirsî: go apo tu dibêjî ez Şêx Evdîme, bavê
Derwêşim, lê Derwêş li kuye, li kêderê dane?
Mî nav û dengê Derwêş bihîstîye li welatê swerqê, li nava
hevdê tewnane, li cemaeta girane.
Axa û beg li wir da li hev dicivin dîkin naxilê û xeberdane.
Dîkin behsa herba Derwêşê Evdî, herba di girane.
Îca niha Derwêş kanê li kêderê dane?
Ay lê... yardê... Lololol dilê mi li yane.
Sed car dilê mi li yane.
Serê dilê mi kule, binê dilê mi bi dûmane.
Lawo edetê mala meye, gava bikevin xewa di girane.
Heft rojan ranabin li xewa di girane.
Îro belê çare, Derwêş razaye, hê sê roj wexta rabûna wî jî
mane.. (*dûmahî heye*)



ÊLA KOÇERÊ BOTAN

BEXT REŞÊ KOÇER

Naskirina Êlê :

Êl tê naskirin bi bavikekê yan bi yêkitiya hêjmarek bavik û yan bi yêkitiya hêjmarek êl .

Û hingê êla hêjmara bavik û êlên wê gelkekbin ew êle bihtir dikare .

1 - femandariyê li herêmek fireh bike .

2 - Berevaniya xwe bike dijî sîtem û êrîşên biyanî .

3 - Parastina rêzik û edet û filoklorên xwe yê kevnare bike ji qirbûn û wendabûn û guhertinê .

Ev pêşgotine li ser hemî êlên Kurdan tê belavkirin û bi taybetî êla Koçerên Botan , ya emê neha li ser bi axivin .


Êla Koçerên Botan du hevbendin .Hevbenda yekem ji wan re dibêjin ÇOX SOR , û ev hevbende di hundirê xwe de pênc êlên mezin hebêz dika , ew êle .

MÎRAN , DÛDÊRAN , GARISAN , ALIGAN ,GORAN û ev hevbende hatiye damezirandin bi serokatiya MÎRAN .

Hevbenda duyem ji wan re dibêjin ŞILID û ev hevbende jî di hundirê xwe de pênc êlên mezin hebêz dika , ew êle .BATWAN , XÊRIKAN , TEYAN , MÛSAREŞAN , KIÇAN û ev hevbende jî bi serokatiya BATWAN hatiye damezirandin .

û ev dara henê xweşik van gotinan şîrove dika

Koçerên Botan



Ji van êlên Koçerên Botan evên me bizman anîn emê tenê li ser êla MÎRAN bi axivin .

MÎRAN .

Wek me diyarkirî **MÎRAN** êlek ji êlên Koçerên Botane ji hevbenda Çoxsore û wek ew didin xwiyakirin dibêjin em kevnarên Kurdanin û em Kurdên resenin û tiştê di pê van gotinan esehî dikin , dibêjin bingeha me ji Cizîra Botane û Cizîra Botan di nîva Kurdistanê deye û ev sedemek serekiye ziman û gerdêş û rêzik û edetên me hatine parastin ji wendebûn û guhertinê .

Û sedema boşbûna êla **MÎRAN** û mêrxasî û lehengiya zilam û mêrên wan , êla **MÎRAN** fermandarî li herêmek gelekê fireh dikir û ji sînorê herêma cizîra botan derdiketin û ji ber jiyana wan bihtir li ser xwedîkirina pezbû , çêra pezên wan li kî deverê peyda bibya li wir xwe digirtin bê kes bikare bersivan wan bide .

Ji ber vê yekê zivistana xwe didan li beriyê û di beriyê de diçûn heya dighan li çiyayê şingalê , ji ber erdê ras û germê û ji wan deverên Koçerê MÎRAN li ziviztanê xwe lê digirtin û lê diman heya buharan , **TIL KOÇÊER** , **GIRÊ FATE** , **KOZ** û **HEMO KER** ev devere hemî bi wan hatine navkirin Û havîna dîsa li Cizîra Botan û zozanên wê vedigeriyan ji ber

hînikbûna xurista wê û zengînbûna wê bi hemî corên geya û kulîlkan û av û kaniyên wê yên herî zehif û pezên xwe li palên çiyên û li ber kevên av û çeman di çêrandin .Û ev rêjîme her wisa **MÎRAN** her sal berdewam dikir , heya dawîya şerê cîhanê yê yekem û şikestina dewleta Osmanî li ser destên dewletên hevbend û gihiştina wan li , li hevhatina Saykis Bîko û parçekirina wan û danîna sînorên siyasî ji herêma re .

Û neha Koçerên MÎRAN belavin li herêmekê di navbera sînore Iraq û Sûryê de .Herêma wan li Sûryê ji Rimêlan dest pê dike heta dighe raserî bajarê Dêrika Hemko û gundên wan yên li Sûryê Sewêdî , Sêgira , Girzîro , Girasor , Tepqa , Besta Sûs , Qereçox , Kaniya dirêj , Girkendal , Til Xenzîr , Kelha Deham , Quldûman .

Û herêma wan li Iraqê ji Rebî'e'a dest pê dike heya dighe raserî bajarê Zaxo , û gundên wan yên li Iraqê , û tiştê me divê em bidin xwyakirin gelek gundên wan li Iraqê bi bavikên wan têne navkîrin ji wan gundan .Tawos , Îsigan , E'lyogan , Masegan , kelha E'merê Salih' .

Çi êla , çî kesên , çî rêwingiyê dan û standin û hevjin bûn bi êla MÎRAN re kirin tim nêrnek baş li ser wan birine û tim ji wan re bûne pesindar û tim sipasiya MÎRAN kirine li ser arîkariyên MÎRAN bi wan re kirin û ji şhadeta yên bi êla Koçerên MÎRAN re dan û standin û hevjinbûn kirin êla Koçerên MÎRAN aşî xwazin dijî sîtem kariyêne ji arîkariyê hezdikin û dilovan û dil nazikin û gelekê qedrê mêvanan digrin û merd û kerîmin û gelekê ji pîrekên xwe hezdikin û pîrekên wan hinek azadî li cem peyda dibe û rêzgirtina extiyarên xwe dikin .

Ji berhemên wan nîrên zehmet yên êla Koçerên MÎRAN di tê re derbas bûyîn , Koçerên MÎRAN esehî dikin ku ew êlek xuyahîne ji hemî êlên Kurdan û bê goman hê xwediyê civakek resenin di rêzik û gerdêş û e'detên xwe de .

JI FOLKILORÊ BERAZAN

Bervekir : Elî Şêxo

Xwendevan.n hêja û delal , ev sitrana li jêr
nivîsandî di nava hem Êlên Berazan
û Denan de kesek yan jî tu qîzek
bîna bedewbûn û sipehîbûna yara vî
xortî nîne , navê yara wî Edlêye li
gorî heskirina wî ji Qîzîkê re hemî
Qîzên koç û êlan nîşana Edla wî
nadin , ev dîlok têtê gotin di ber
govend û bazdanê re , yekser pêşîya govendê digire
vê sitranê di bêje , govend ji hemî lê vedgerînin , ev
dîrok vedgerê berya 300 salên berê , demê koçerên
beraza buharê berê xwe di dan berya sirûc û kobanê
çêregeha pezê xwe :



DE SINE

De sine Edlê sine

Derbûn beraz û dina

Çûme pêşîya koçana

Edla min dinav de tune

godgerî li wê ciwanê Edla teb çi nîşanê

Midgo zeriyeke qence

More ligockê kitanê

Pêşya koçan qeyaskir

Dawîya koçan qeyas kir

Edla xwe di nêvse naskir


gewra xwe dinavde naskir

Ez ji xew rabûm, gulfiroşek dî,
Pir gelek şa bûm, gul bi dil didî.
Gul bi dil didî.
Hebû me yek dil, tev jan û kul bû,
Ne bûme bawer, gul bi dil bidî.
Gul bi dil bidî.
Bazar me kir go, ser bi ser nadim,
Ê gulperest bî, can û dil didî.
Dil bi kul didî.
Min go kê didî. Can û dil bi gul,
Go ev bazar e, dil bi kul didî.
Dil bi kul didî.
Min can û dil dan, dil kiriye qêrîn,
Go ho Cegerxwîn, dil bi gul didî.
Dil bi gul didî.
1903 - 22 / 10 / 1984

Erdhej

Şêrko Bêkes

Eve hawara Bakur e
Bûye fûwareya sirûda
erxewaniyê
û...Heya nik xwedê bilind bû ye
An jî xuşîna derya ye
Hirrîna avê ye û
nalîna çiyayên vê dîrokê ye
Eve xwîne an jî şefeqe rijya ye?
Eve giyaye an jî azare şîn bû ye?
Eve pêl û milên xelke an daristan?
Eve hêrsbûna baye an veciniqîna hewran?
Ev jin in an dar in?
Porê wan bûye meşel?
Ev mêrin an hespên bijî berfîn in
Nav çîrok û destanan?
Ne destan e, ne bareş e, ne derya ye...
Ne jî film û xewdîtin e!
Em Erdhej in...
Ev em in, hemû pêk ve...
Bûn cadeya van bajaran
... û bûn golên nav meyadanan!
Ev em in, Çiqas mê ye
Hemû yek navê wan heye ku Zekiye ye
û... Çiqas nêr e...
Hemû yek serê wan heye
Ew jî serê Musa Anter!



EZ ? TUNE

SALIH> HEYDO

K, delala dil. mine
K, gula bilbil. mine
K, b,hna sorgul. mine
K, melhema dil. mine
K, xewna aqil. mine
K, \,r. simb.l. mine
Ger tu nebe zer, `ine
Dij,n. de ez / tune
Ji te p.ve tukes tune
Dinya bib, sero bine
Zery. bera tu zanib,
Ez / tune [ez / tune
Bel. zendim tu bazine
Ev,na te m. rga mine
Tu l. r,han / sosine
Hezar hor, ji mer wer,ne
Yar. ten. b'dil. mine
Buhar `end, \,n / xwe\`e
L. b. te erdk, repine
L. b. te erdk, repine

Xwezî carek

Şêrîn Şêxo

Xwezî carek
Ji kişwera giyan
Tu sirgûn bibayî
Bê evîn ez bijiyama
Xwezî şevê ji şevan
Li ser çoka heyvê
Min sere xwe danya
Stêrkên nazdar
himbêz kirina
Û...çavên te bibana
Mîvan li çavên min
Wê demê
Minê baweriya xwe
Bi kenên cejnan anîba
Û..minê
Li ser lêvên xwe
Kenek bufiranda
Û berda nav
Revfên zarokan



Roj bi roj. di qed,nim
tu bi mal / pere lo
Qey ji bo dest. qela\t,
Tu li min nanere lo
Ez te herd/ ji xwel,k.
Xwe neb,d'ser mere lo
K. tu f. rkirye ku dinya
Nebi `erx / gere lo@
Netim, pay,z bi x. rin
Ne tim, por qere lo
Nav bera j,n / nej,n.
Ev temen ko`ere lo
Bi xwed. dinya wihaye
Tim / tim w. here lo
Pi\t, kesekaya buhar.
tim / tim j, zere lo
Were ,ro bi co\ b. riya te
Were ev dil vedaye l'h. viya te
Were ku sal li sal. j, dibore
Bi min xwe\ t. heya b. bextiya te
Di nav beyna xwe / hi\yariya me
Li ber `avan di ` , t. siya te

Ku \ev dert. / heyv / rok te vedxwe
Di rok. de di b,nim ruhniya te
Di b.j, qey ji axa ber feratim
Dema firkim ji `ilk. n av,ya te
Dib. j, qey ji tay. nav \imame
Li min ketine `ir,sk. n ariya te
Er. d,lber [er. `av. n tey, re\
Er. \op. n mey, ser v. riya te
Bi kur de `/n gelo `ax. n ev,n. @!
Li ser kabok / `okane xuya te



B ijî  Saliya
(P.D.P.K.S)

~end, bi h. v, b/m
~end, bi neyaz b/m
Ku ji v. tevin / tor.
Rizgar / azad bim
~i tevn / torek
Dijwar / dije
Bel. roj. n min
Hava dimije
Afrandina min
Her dem dikuje
~i kab/se ev
B. hn. d`ik,ne
|,nkay, ya min
Werdiger,ne
Ber / gul. n min
Di `ilmis,ne
Min di al,ne
Min diqulip,ne
B,yabanek xal
Pir ziwa / tal
~olek xirr,xal
B. kes / b. mal



JIN JIYANA MEROVANE

/ . r, n Qasim

Jin jiyana merovane

~ira / fenera jiyane

Jin dayika zarokane

| , rdaya ke` / kurrane

Navek pir | . r, n / xwe\ e li c, han.

Ew nav. \ . r, n [nav. an.

~iqas, ez geryam li c, han.

min ned, t navek, giran

wek, nav. an.

Ez diljar / dilmaya an.

Net. kir, n ne bi peran

? ne bi z. ran.

Ez , ro p, rozdikim cejna an.

? leyla qasim li goristan.

? leyla zana li zindan.

Pir jin heb/ n wek, me bin dest b/ n

L. wan xebat kirin bi riyek zaneb/ n

Hey\ t. avdar. ji bo me kirin cejn / heb/ n

Dest bi hevdi w. b. roja serxweb/n
Azadiya jin. ,ro li her cih, bela b/
Li nav turk / ereb / eceman
<ro li Kurdistan. j, part, zan b/n
Kon. kevneperestiy. rakin
Ew r. `ika teng fireh bikin
Bindestiya gemar, re\ bikin
~, `ek / n. rgizan r/ge\ bikin
Bere rohn, bidin li v. j,n.
Bi deng / soz. n ev,n.
Li v. c,hana xwe\ / \. r,n.
Bi lez bi hevdi mizg,n.
Bi hevre sozdarbin weke mem / z,n.



B ijî  Saliya(P.D.P.K.S)

DI MEYXANÊ

Berhîm Qasim

Çi nizanim me dixwest her gule şenge
Tu nizanê çi di dil vaye xedenge
Tu ne hati di xewê her tû nizanî
Were dilber li me şer û xirecenge
Qedera min eve îro çi hejarim
Di gera eşq û evînê çi lehenge
Mi dixwest her tu bibêjî gulenarim
Xwe ne berdî di çi dest û di çi çenge
Te nikarî xwe bi parêz di meyxanê
Weke serxoş di semayê çi çelenge
Xwe seranser di hejînê were canim
Ne tenê mest û hejarî wera xanim
Bi hezaran di cihanê reşe tenge
Ne memê al me tû zini ne ciwanim
Tû binêr pîre şivanim me ne zende
Bikevim ber û singa te binoşm
Bi gevêz min tû bilingê çi derenge
Kesera can bi şikine were yarê
Keve ser can ne bitirsi hemu renga
Kedera min eve cane te bi noşim
Bike qîrîn û hewarê tû bi denge

HEVPEYVÎN LI GEL HUNERMENÊ KURD ŞEVGER HOVIK

Gulistan

Gulistan : em bi xêr hatina te dikin wekû mihvanekî xwendevanê kovara me

Şevger : dilşa me ku we ev hevpeyvîn bi minre kir de ez di rêka we de xwe bighînim evîndarê stran u hunera xwe ez sipasîya we dikim.

Gulistan : xwe bi gohdaran bide naskirin ?

Şevger : ji zaroktxîya xwe de ez gohdarîya min ji strana kilasîk hes dikir ji ber bavê min deng xwesh bû wî her şev stran ji mere digotin û gelek caran bavê min digot wek min stranê bêje hîna temenê min 10 salî bu,, ez 1957 li gundê Kêbîkê hatime dinê u ez kurê bajarê Tirbêspîyê me û tê bîra min ez 12 salî bûm min di mala Mihyedin Haco de stran gotin u hunermendAram Dikran ji minre li Comboþê dijenîyand ,, di sala 1973 min bi hunermend Mihemed Teyib Tahir re stran gotin li Lobnanê.. 1976 min di komela selahedin de li Ordun stran gotin...berî ez ji bîr bikim ji salê 1973 min helbesta stranê dinivîsand u wan deman de helbestên min gihana hunermend Nezir mihemed u cemal sadun u kaniwar u Nasir Temo u hijmarek din.. 1977 min kasêtek tomarkir ji kilasika kurdi 1980 kasêta min ya yekemin bi navê / welatê min / piranîya stranan ji awaz u helbestên min bun u 2 helbestê Seydayê cegerxwin ji hebun wek keko ziman dirêjim u bibin markisi ... hunera min bihtir siyasi u niþtîmanîye u min di koma Narin de berpîrsariya huner dikir heya ku ez derketim ji welat 1988. min 4 kasêt tomar kirin li welat

bila gohdarên hêja bizanibin di wan deman de hunerbêjî ne hasan bû gelek eger hebun u astengî pîrbû di rîya hunermendî de, di salên 1970 civat pîr papkeftî bû u civak aþrtî bû u malbat di bin sinorên islam u aþîr u fewdalîzmê debû xelkê li hunerê u li hunermend regekî reþ dinehêrt u pîr çaran þerê wî dikirin u ji malbatê berawî didan yan jî jin jî ne didana wî axir derd pîrbûn,, lê di destpêka 1980 komên felklori hatin damezrandin u li vir 1000 sipasi bo tevgera kurdi u partiyên me ku wan pîr qîmet dana hunermendan u dikarîbûn di van koman deher sal bi 10 hunermend diyarî gel bikin..

Gulistan: çima ji welat derketî?

Şevger: pîr sedem hene yek ji wan sedeman ku rêjîma Surî bi beryarek ne rast ji karê posta Qamiþli ez avêtim u kar li ber min qedexe bû ji egerên ku min styrana siyasi digot ..weku din jî birayeki min wefat bû u xwepka min Amîra fesil kirin ji xwendinê u min dit ku malbata min buye armanca hêzên awlakarîyê u rêjîmê pîr ajotin ser min sed mixabin ku min ew beryar da ku ez derketim ber Swed , xweska ez li welatê xwe u nav gelê xwe mabama ji ber xeribî mirina insana

Gulistan : te feyde li dervî welat dit u gelo ti difikire ku vegere welat?

Şevger: Feyda ku min dit min 5 zarokên xwe baþ dana xwendin u isal her 2 krên min Shoresh u Rogesh zango xelas dîkin, shoresh musik xilas dîke u Rogesh hendesa kampyoter xelas dîke u keça min ya mezin ilom siyasi dixwine u pîraniya wan musikjenin .. ji hêla abûrî de u aramîya malbatî de min feyde dit u her wisa bi xêra Passaporta Swêd min dikarîbû herime Amed u Mihabad u Hawlêr u Suleymaniyê u min dikarîbû baþtir musika xwe tomar bikim.. ax u 1000 cari ax bo

vegera welat,, belê ez her rojekê li xerîbîyê 100 carî
dimirim divê ez vegerim qamishloka xwe nav newroza
welatê xwe

Gulistan: ki alikariya te dike bo hunera te u astengî
çine?

Şevger: kesekî alikariya min bi wereqekê ne kirîye u
astengî pirin bo xebata hunerî li derve wek :

1-Dûrbuna hunermendan ji hevdû

2.kesek alikarî belaf nake

3.ew amîrê musîkê yê kurdi resen peyda nabin li
Europa

4.ya herî zor ku dezgehên kurdî yên tomar kirin u
belav kirina cd li Eropaya nînin.

Ez hemû cd xwe u vidio kilipên xwe li mal tomar dikim
ji ber kurê min Shoresh xwendina musik de u ew
alîkare bi minre..

Gulistan:çima tu di nav siyasetê de yê u gelo siyaset te
na îþîne??

Şevger: pîrsek girînge... ez çî bikim qey bextê min bû
ez bi zaroktî ketim evîna welat u heskirina pêþmergan
de u min helbest bo niþtîman nivîsand u ez bawer
dikim hunera min pîroze ji ber min strana azadiyê
gotiye li dijî zordaran u ez ne poþmanim çiqas min zor
u tahlî dîtibe di jiyana xwe de ji ber min bi beryara xwe
ev rêbaz hilbijartîye u dimîm heya bi mirinê dengê
dijî zorê u dengê bo azadiya Kurdistan.. êþandina
dujmin ji min re normal dibînim bes mixabin carna
gîropek Kurd jî min têþînin . hhhhhhhh eger min huner
ne kiribana belkî min partiyek çêkiribana bi navê
partiya serxwebûna Kurdistan ji ber ez tîyê azadîyê me..
bes netirsî ez partiyekê çênakim u ez dijî pîr bûna
partiya me u ritba herî pîroz bo min xizmetkare ,

xizmetkarê bizava kurdîbim u ji bîr mekin hunermend u
rewşenbîr ew yên her bi rometin nav gelan de,

Gulistan: te çima koçka rojavayê kurdistan vekir ?

Şevger: ji ber me kurdê Suri Telvezzyonek stalayêt nîne
u kesek giringîyê nade beþê rojavayê kurdistan u teybet
dengê tevgera me u siyaseta rojavayê kurdistan dûre ji
nasînê... min xwest ku ez dengê serok u rêberên tevgera
kurdi bighînim revenda kurd li Europa u bighînim
andam u dostên wan u bighînim kurdên parçên din jî ,
- min xwest ku em berevanîyê ji doza tevgera xwe
bikin hemberî leystikên dujmin u hinek kurdên ku dibin
destek ji dujminre li Eruopa u dixwestin xwe bikin
bedil ji tevgera hundurî welat re

-me xwest ku em girêdanekê bikin navbera hunermend
u rewşenbirên welat u derve re

-me xwest ku di riya kocka mede xebatên mesh u
çalakiyan bibe li Eropa

- koçk bibe wek cihê raghandina tevgera kurdi u
piþtgiriya tevgera kurdi u pêþwaziya nûnerên tevgera
kurdî u her þev semînerêk siyasi yan rewşenbirî

-ez sipasiya hemû xebatkarên kocka rojavayê kurdistan
dikim u teybet birayê Jîr u Har xelkê Ameda delal.

li domahîyê ea sipasiya kovara Gulistan dikim u 1000
silavên min ji xwendevanên wêre u gohdarên strana
mine u ez dibêjim ez her berdewamim bo hunera kurdi
u xebata siyasi u bijî kurdistan u bijî tevgera kurdi li

rojavayê kurdistan

Birayê we Şevger swed

www.sevger.se

www.rojavayekurdistan.net


GOTINÊN PÊŞIYA

1. Destê bi tenê, deng jê nayê .
2. Aşê dînan bê av digere.
3. Ava bin kayê deng jê nayê .
4. Ava hêdî me ecêb jê dî.
5. Benîştê dînan ji ritil ye .
6. Av di golê de genî dibe.
7. Devê rovî negihîşt tirî got tirş e.
8. Bi werîsê dînan xwe bermede binê bîran.
9. Dengê diholê ji dûr ve xweş e.
10. Kes nabêje dewê min tirş e.
11. Pîrê memire bihar tê, kero nemire qîvar tê.
12. Rûyê beqê di avê de şil nabe.
13. Aqilê Sivik barê girane .
14. Rovî ne çû qulê, hejek bi teriya xwe vekir.
15. Zêr zane, zor zane, devê tivinga mor zane.
16. Agir berda kayê û xwe da aliyê bayê.
17. Kurmê darê ne ji darê be dar kurmî nabe .
18. Tas hat û çengirî çî tije û çî vala
19. Serê ne êşe desmalê lê girê mede.
20. Va şar û vaye minşar .
21. Hespê çê êmê xwe zêde dike
22. Bilûra liber gaye , çira liber koraye .
23. Kurmê şîrî heta pîrî.
24. Tir li ku û das li ku .
25. Yê li hespê xelkê siwar be her peyaye.
26. Dengê defê ji dûr xweşe.
27. Ecelê biznê tê nanê şivên dixwe.
28. Kero nemir heta qîvar şînbê.
29. Benîştê dîna ji ritlêye.

30. Rî dibe bost lê dujmin nabe dost.
31. Giya dibin kevrade namîne.
32. Go koro tu çi dixwaze , go çav .
33. Bîra avê jê vexwe kevra navêjê.
34. Ga dikeve kêr lê pir dibin
35. Yê deva xwedî bike divê deryê xwe bilind dike.
36. Ê here masiya divê qûna wî şil bibe.
37. Tirek û du tir licem tireka wek hevin.
38. Giyayê hewşe tale.
39. Ez mîr, tu mîr kî wê bibe wezîr.
40. Ez bê ez tu bê ez wê kî here ber pez.
41. Xwar rûne lê rast bi axife .
42. Zimanê dirêj daqoqê serê xwediyaye .
43. Gotina xweş buhara dilane .
44. Her tişt bi ziravî dişkê, lê mirov bi stûrî .
45. Ji mêra nav dimîne, ji ga çerm .
46. Ko agir bi çiya ket, ter û hişk tev de dişewitin .
47. Ko ker ket heriyê, xwedî wê rahêje teriyê .
48. Mû bi mû, di be rih .
49. Rî dibe bost , dujmin nabe dost .
50. Nû hatin, kevin xelat in .
51. Rovîkî geryayî çêtire ji şêrekî girêdayî .
52. Ez dibêjim şamborek tu dibêje bê navik .
53. Gundê bê rez, konê bê pez, mirovê dibêje ez û ez ,
hemî ne tutiştin .
54. Kes qala gurî nedikir rabû di devê kaniyê de
gûkir..!!! .
55. Bê şêx û pîr meçe dîwana mîr da nekevî halê feqîr
(*Amadekirin: Gulistan*)

Naverok

| Gotar | Niv,skar | R/pel |
|-----------------------------------|------------------|-------|
| pêşgotin | gulistan | 3 |
| GOTAR ? L>KOL<N | | |
| Rew\enb,r. n bi rast, | Selman Hes | 5 |
| Koma Newroz | El, emd,n | 7 |
| Bandora Sirgûnê | Konê Re\ | 14 |
| Dr N/red,n Zaza | Hesen Seyfedîn | 19 |
| Milet. xwe bi nase | Salih ê Heydo | 22 |
| Giringiya Ziman. Kurd, | Fewaz Hesen | 27 |
| Heger tu bi pirbî tê bi girbî | Ferîd cezîrî | 29 |
| Xanima navdar : Nefertîfî | Biradost. M,tan, | 31 |
| Gabriel Garcia Marquez | Hêvidar Zana | 33 |
| JI FOLKLORA KURD< | | |
| Orta mêr û jin | Bavê Serbest | |
| D,rokek Dankut. | Salih. Heydo | 37 |
| Qewl. n . z,diya | Eskerê Boyik | 40 |
| Derw. \. evd, | Gulîstan | 44 |
| Êla Ko`er. Botan | Bextre\ Ko`er | 51 |
| Ji Folklorê Berazan | Elî Şêxo | 54 |
| HELBEST | | |
| Gulfiro\ | Cegerxwin | 55 |
| Erdhej | êrko Bêkes | 56 |
| Ez / Tune | Salih. Heydo | 57 |
| Em yekin | Xalid | 58 |
| Jinek b. h. v, | Selwa Dar, | 60 |
| Jiyana mirovane | .r,n Qasim | 61 |
| Di meyxa. | Berhîm Qasim | 63 |
| HEVPEYVÎN Û GOTINÊ PÊ IYAN | | |
| Hevpeyvî li gel Şevger | Gulîstan | 64 |
| Gotinê Pêşiyar | Gulîstan | 69 |
| Naverûk | Gulîstan | 71 |



Dr. Nûredîn Zaza

Dîmenê Pelê Pêşî : hunermendên Koma Newroz (1986)
pelê dawî Sê Zerî bi kinc û bergên gelêrî ji herêma
KOBANÊ ... ji erşivê : Salihê Heydo

di sala 1968an de Cegerxw,n
damezrandiye / b/ye berpirsyar. W.



Sê Zerî bi kinc û bergên gelêrî ji herêma
KOBANÊ ... ji erşivê : Salihê Heydo